# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (239):

## Komkujiyeke hovane li Cindirêsê di şeva Newrozê de û tevgereke cemawerî ye şermezarkirinê, girtineke bêsûcane, qutkirina daran, binpêkirinine virdewêde
























Li ser asta herêmî û navdewletî naskirî ye ku cî û nirxeke bilind e Cejna Newrozê li ba Kurdan bi giştî heye, ew ji kevin ve pê şahiyan li dar dixin, weke rojeke nû ji Aştî û Azadî û wekheviyê û simbolekê ji nasnama wan a netewî re, û ji roja roj ve dijminên wan şerê vê bûneyê dikin û bi her awî jî hewil didin da ku wan qedexe dikin ku wê vejînin, ji bo wê jî wan di ber berevaniya wê de fedekariyin mezin dan; Ji ber wê destlatên Dagîrkeriya Turkiyê û milîseyên wê azadiyên giştî diguvêşe û binpê dike û qeyd û bendan li ser bûneyên Kurdî li Herêma Efrînê datîne, bi ser heyamên metirsiyê yên ji pênc salan ve serwerkirî; Bi giştî îsal jî li darxistina şahiyên Newrozê sînorkirî û di çarçewên teng de bû, herweha jî komkujiyeke hovane li Cindirêsê pêkhat, lê herdu hikometên Şamê û Anqerê û ajansên nûçegîhanên wan ên fermî li bermberî vê bûyera mezin bêdeng man, wekî xwedanyalê ji erk û stubariya siyasî û yasayî, û şûnvekşandineke nesinciyane û kirêt.

**Yekem= Kumkujiya Cindirêsa wêranbûyî**:

Li şeva Cejna Newrozê ya ku Kurd ji kevin ve têde şahiyan li dar dixin, li Bajarê Cindirêsê - Efrînê çekdarine endamên "Artêşa El'şerqiyê/ Tevgera Rizgarkirin û avakirinê - Eqîd Hisên Hemadê, Feyleqê Yekê - Eqîd Mu'itez Reslan, Hikometa Sûrî ya Demkî - Ebid El'rehman Mistefa û Şalyarê Berevaniyê Emîd Hesen Hemadê, Hemahengiya Niştîmanî ya hêzên şoreş û rikberiya Sûriyê - Salêm El'mislet, Turkiya Dagîrker - Receb Teyêb Erdoxan" çar sivîlên Kurd hembirayên hev (**Nezmî Mihemed Osman** /53/sal - li siba/21/ê Avdarê di Nexweşaxana Leşkerî de li Bajarê Efrînê mir, **Fereh El'dîn Mihemed Osman** /45/sal û kurê wî **Mihemed Fereh El'dîn Mihemed Osman** /19/sal, **Mihemed Mihemed Osman** /38/sal ) kuştin, û birîndarkirina "**Fîras Ebdo Xelîl** /14/sal" ê negîhayî û xwediyê pêdewîstiyên taybet, bi qurşînkirinê.

**- Bûyînên hene:**

Milîseyên "Artêşa El'şerqiyê" ya naskirî ku piraniya endamên wê berê ji Rêxistina Da'işê bûn û ji wan herdu serkêş "**Mahêr El'ûqal**" û "**Menhel El'ûqal**" li Gundê "Xalta" - Navça Cindirêsê bi bombebarankirina balafirên Hevbendiya Navdewletî li 12.7.2022an. Z de hatin kuştin, nehîştin ku xelkê gundên ku desteser dikin "Xalta, herdu Miskên Jorin û Jêrin, Axcelê" - N. Cindirêsê şahiyên Cejna Newrozê li dar bixin û agirê wê dadin, û ew bi lêdan û girtinê gef kirin; Û giropeke din jê (ye ku "Hesen El'debi'i/ Ebû Hemze Xeşam" serkêşiya wê dike) destpêkê bi sedema ku kurê birayê wî agirê Newrozê li ser bana mala wan dadayî bi kevir û pehîna li "**Nezmî**" xist, li dema rûniştina wî li derveyî mal li cem agirekî ji bo germkirinê (weke adetê ji dema rûdana erdheja /6/ê Reşmehê ve), paşê jî rişêş anî û qurşîn li ser hev avêt sîng û zikên qurbaniyên ku ji mal derketine ku bibînin çi bi serê birayê wan ê mezin hatiye, û ta ku piştî ketin erdê jî, û di dû re jî revî, û her vêgunehekî ji wan ji /10-15/qurşîn lêketibûn.

**- Tewankar:**

Ji wan (Umer Salêh El'esmer - zayîna /2000/î, Hebîb Elî Xelef - zayîna /2004/an, Bîlal Ehmed El'ebûd - zayîna /2000/î) bi piştgirî û palpiştiyeke yekser ji "Elî Xelef/Ebû Hebîb Xeşam" - bavê kujerê diwem û endamekî "El'şerqiyê" yên pêşeng hatin naskirin, û ew ji Gundê "Xeşam" - gundewarê "Dêrezirê" ne; Û li gor perçevîdyûke "Tevgera Rizgarkirin û Avakirinê" hate xuyakirin ku ew hatine girtin û radestî "Asayêşa Leşkerî li Cindirêsê" hatine kirin.

**- Delametên li piş:**

Ji pênc salên desteserkirina Dagîrkeriya Turkiyê û nandozên wê ve li ser herêmê binpêkirin û tewanên têvel di dermafê wê û xelkê wê de berdewam in, qurbaniyên komkujiyê jî tûşî wê bûn, û bînerdayînên jinên nêzîk pakrewanan li ser curbecur alavên ragîhandinê hovîtiya wan qirêjiyan û komkujiya dawiyê, asta kîn û kîndariya ku endamên milîseyan û yên jê ve nêzîk beramberî Kurdan de hildigirin riswa dikin, û herweha jî tundrewiya olî û nijadperestiya di tenga Cejna Newrozê re mîna ku "gawirtî û netewperestiyeke cudewazî" ye.

Lê Hikometa Demkî û şalyara wê yê berevaniyê û serkêşiya "Tevgera Rizgarkirin û Avakirinê" di daxuyan û dengbixwexistinine fermî de hewildan stuyê rastiyan badin, sedemên tewanê vegerandin "devavêtin û pevçûneke" di navêna qurbaniyên vêsûc û tewankaran de, delametên li piş bûyerê demkî nîşan dan, endamtiya dijberan ji "El'şerqiyê" re red kirin, û gotin agir ji çadiran ve nêzîk bûn; Û herweha jî derewîna ku "berê Artêşa Niştîmanî şahiyên netewî û olî diparast" - li gor"Tevgerê", û herweha jî "Şahiyên Cejna

Newrozê hersal li herêmên xelkê me yê Kurd di herêmên rizgarkirî de, bê qeyd û bend bi rêve diçin" - li gor "Hemahengiyê"!

**- Tewaneke berê:**

Û ji doseya "El'şerqiyê" ya tewankariyê, piştî ku giropa çete ya "Hesen El'debi'i/Ebû Hemze Xeşam" li dû dawîbûna şer û basmîşkirina wê ji Gundê "Çeqelê Cûmê" - N. Cindirêsê re û dorpêçkirina wê li 18.3.2018an. Z -yê ku tu şer têde nebûn- herdu xortên sivîl "**Hisên Ebid El'rehman Hisên** /24/sal, û **Welîd Soranî kurê Cemîl** /18/sal" bi qurşînê îdam kirin, û qedexe kir ku merivên wan bibînin û di veşartina termên wan de beşdar bibin.

**- Dijîkirineke berê:**

Wêneyek ji me re hat, asta işkencekirina mekin (ya ku Pakrewan "Fereh El'dîn Osman" di dema girtina wî ji aliyê Milîseyên "El'şerqiyê" ve bi sedema daxwazkirina wî ji mala xwe re tûşê hatiye, di destpêka dagîrkirina Efrînê de li sala 2018an. Z) diyar dike.

**- Dapirsîn:**

Li ba Xelkê Efrînê tu bawerî bi "dezgehên ewlehî û dadweriyê" - yên ku Dagerkeriya Turkiyê damezrandine - tune ye, ji ber ku ji pênc salan ve bûne alavên zordarîkirin û bindestkirina wan û hreweha ji bo filtandina tewankaran ji sezakirinê, nemaze ku doseyên bi dehan zaroyên wan ên belgekirî -di nav de jî jin û zarok- hene û bê pêngavên lêkolînê û dadkirineke aşkere û dadmend hatine girtin, ji ber wê pirîcaran wan ji bo berpirsîdan kujerên komkujiya Cindirêsê ya dawiyê li ba dadgeheke navdewletî dengê bilind kirin.

**- Berpirsiyartî:**

Ew kujerên ku bi kîn û kîndariyê tijîkirî, endamên govdeyekî leşkerî (Artêşa Niştîmanî ya Sûrî) ne, ya girêdayî aliyekî cîbicîker (Hikometa Sûrî ya Demkî) û sîwana wê ya rêzanî (Hemahengiya Niştîmanî ya hêzên şoreş û rikberiya Sûriyê), û ya ku Hikometa Dad û Geşepêdanê - Turkiyê bi serokatiya "Receb Teyêb Erdoxan" serpereştiya wê dike û xerciya wê dide, ew hikometa ku li gor hemî pîvanên navdewletî hêrêmê dagîr dike; Û ew tewana weke xelekekê ji zincîra pilaneke ragîhandî û wênekirî ji aliyê Turkiyê ve hat, û bi serpereştiya istîxbaratên wê ji pênc salan ve tê cîbicîkirin.

Herweha tewna li dijî Cejna Newrozê û simboliya wê pêkhat, a ku beşekî mezin e ji kevnetor û dîrok û çanda Gelê Kurd li herêmê, ya ku gelê me di ber de û vejînkirina wê ya salane de fedekariyine mezin dan.

Bi bîr were ku Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" ya hevkar di "Tevgera Rizgarkirin û Avakirinê" de gendeliyê li ser erdê dikin, bi taybetî li Navça "Reco", û serkêşê wan "Hatêm ebû Şeqre" cîgirê "pêşengê tevgerê" û yê navdayî bi tewana kuştina Pakrewan "Hevrîn Xelef û hevalên wê" di dema dijberiya li ser herdu herêmên "Serê Kaniyê û Girê Sipî" de - sala 2019an. Z.

**- Oxirkirin û liva cemawerî:**

Piştî ku merivên qurbaniyên pakrewan û yên jê ve nêzîk li pêş "Nexweşxana Leşkerî ya Turkî li Cindirêsê" - şeva /21/ê Avdarê pirotestokirina xwe nîşan dan û razî nebûn terman radest bibin ta ku tewankar têne girtin, rêvebiriya nexweşxanê term avêtin derve, ji ber wê xwedî û xelk neçar bûn ku wan termên xwe veguhêsin Bajaroka "Etmê" - Idlibê ya hevcîwar li başûr û ya di bin desteserkirina "Desteya Tehrîr El'şam - Nesra berê" de, û bi sibê bo Cindirêsê hatin vegerandin, da ku li Goristana "Gir/Til" bi rêweresmeke gewre û beşdariya bi hezaran ji piştgêran, di nav girî û şînên jinan de, rûmetbilindkirina şehîdan, azadî ji Efrînê re, hildana siloganên şermezarkirin û ne'iletkirina tewanê, sezakirina tewankaran û daxwaza derkirina milîseyan ji herêmê werin veşartin, û xwepêşandan li pêş malên qurbaniyan di rojên di dû re berdewam bûn; Li gel vê liv û tevgerê gotin û daxuyan û têkildariyên ragîhandinî hatin kirin -bi taybetî ji jinên êş dîtî ve- tê de hemî binpêkirin û tewanên ku ji pênc salan ve pêk hatine hatin şermezarkirin û riswakirin, mîna tevgereke cemawerî li dijî dagîrkeriyê û milîseyên wê.

**- Jirêderxistina livê:**

Weke hewildan jirêderxistina vê liva cemawerî ji şopa wê (ya ku Ala Kurdî (Ala Rengîn) weke simbol û nasname rakiriye), rakirina "ala şoreşê" û "ala Turkiyê" li ser malên qurbaniyan û konên mêtîngê di rojên

dawiyê de hatin ferzkirin, bê ku merivên qurbaniyan wêribin nerazîbûna xwe diyar bikin, û li Siba Înê /24/ê Avdarê al û simbol û siloganên Partiya Karkerên Kurdistanê li kolanên nêzîk malên qurbaniyan hatin avêtin, da ku tuhmetên nû bi tevgerê bizelqînin.

Herweha li rojên dawiyê Milîseyên "El'şerqiyê" gef ji xwediyên qurbaniyan re şandin.

**Duyem = Girtina bêsûcane:**

- Li roja Pêncşemê Nîvro 23.3.2023an. Z, Hemwelatî "Mihemed Horo Osman/40/sal" ji xelkê Gundê "Dêrsiwanê" - Navça Şera, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên Asayêşa Leşkerî ve hate girtin, û birin biryargeha xwe li Bajaroka "Qitmê", divê were zanîn ku tu têkeliyên wî bi Rêvebiriya Xweser a berê re tune ne, ew ji xwediyê pêdewîstiyên taybet e, û li Herêma "Şehba'i" - Gundewarê Heleb ê Bakur penber bû, lê piştî mirina bavê wî yê temenmezin û mandina diya wî bi tenê, neçar bû ku tevî malbata xwe vegere warê xwe.

**Siyem = Qutkirina daran:**

Qaserî cih û nirxeke taybet a dara zeytûnê bi taybet di çand û henasa xelkê Çiyayê Kurmênc/Kurdax/Cebel El'kurd heye, wêlomê qutkirina wê li ba mirovê Kurd dijîtiyeke li ser wî bi xwe ye û tewaneke mezin e, û ne kêmtirî dijîtiya li ser mirovan û kuştina wan e; Û bi ser ku demsala Zivistanê bi dawî bûye, hîn jî piroseyên qutkirina darên zeytûnê û îhrac û daristanan ji aliyê çekdarê "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" û yên jê ve nêzîk hîn berdewam in, da ku jîngehîn were qirkirin û pêdiviyên jiyana xelkê werin birîn, û di heman demê de jî ji bazirganiya êzing û komirê tibabine diravî werin qezenckirin, jê:

- Ji dora du heyvan ve, dora /100/darî zeytûnê yên "Ebid El'henan Seydo" ji xelkê Gundê "Miskê Jorin" - N.Cindirêsê, bi piranî ji aliyê Milîseyên "Artêşa El'şerqiyê" û serkêşê wan li gund "Ebû Fewaz El'dêrî" ve hatin qutkirin û hin jê jî hatin hilkirin, û xwediyê wan neçar bû ku êzingên mane ji holê rake û cihê di êrd de biçîne.

- Li vê dawiyê, li G. "Tilifê" - B.Efrînê dora (/12/darên zeytûnê yên "Mihemed Zênel", /25/dar ên "Şêrzad Ne'isan", /10/dar ên "Îmad Hemsoro"), û bêtirî /200/ darî zeytûnê di navêna herdu gundên "Feqîra û Gewrika" - N. Cindirêsê de (jê: dora /75/ daran ên "**Vîndar Hesen Xelef**" û birayê wî ne - Feqîra û /80/ê dar jî yên hemwelatiyekî "Gewrika" ne ), bêwijdan û hinek jî ji kokê ve, ji aliyê Milîseyên "Firqit El'hemze" ve hatin qutkirin.

- Û li Bajaroka "Şera" piraniya dareke sindiyanê ye temenmezin li orta zeviyeke zeytûna ye Malbata "Qehreman", ji aliyê Milîseyên "Firqit El'sultan Melekşah" ve hate qutkirin.

**Çarem = Binpêkirinine din:**

- Li 19.3.2023an. Z bi şev, çekdarina ji Milîseyên "Feyleq El'şam" êrişî mala Hemwelatî "Ukaş Ehmed Qenber/65/sal" ji xelkê G. "Qestelê - Meydana" - N. Reco kirin, û mekin li wî û hevjîna wî "Sû'ad/69/sal" û lawê wan "Şerîf/32/sal û hevjîna wî" xistin, û di encamê de "Ukaş" bîrve çû û hin din jî derizîn û birîndar ketin, û piştî cîran hatin çekdar revîn; Ew giş jî ji ber ku "Şerîf" nerazîbûna xwe ji şikandina pîk û şaxên darên wan ên kerezê re, ji aliyê jinên çekdaran ve nîşan daye.

Û berî wê li 5.3.2023an. Z, giropeke ji endamên "El'feyleq" li Bajaroka "Meydanekbezê" - N. Reco mekin li Hemwelatî "Se'ïd Mihemed Qenber/59/sal" xistin, bi tuhmeteke çêkirî (qaşo li jina çekdarekî nihêriye), piştî çandina yê êriş ser bûye ji çend hiktar erd re, û hewildana serkêşên "Feyleqê" ku wî jê biqewtînin.

Li 22.3.2023an. Z, çekdarekî Milîseyên "Lîwa'i Semerqend" li Bajaroka "Kefirsefrê" - N. Cindirêsê mekin li Hemwelatî "Ibrahîm Xelîl Xorşîd/Derec" xist, ji ber ku daxwazkirina wî ji mala apê xwe ya ku wî çekdarî dest daniye ser, û di encamê de birîndar bû, û herweha jî çekdar bi çekan gef dan apê temenmezin.

Li 24.3.2023an. Z, li Bajarê Cindirêsê, giropeke ji "Artêşa El'şerqiyê" mekin li xort "Hesen Mihemed Hemîd" xist, bi behaneya ku wî di mêtînga piştgiriyê de bi xelkên qurbaniya komkujiya Cindirêsê re Ala Kurdî hildaye, û di encamê de birîndar bû û poz şikiya, û bo nexweşxanê hate şandin.

Li dawiyê: Weke helwesta yekê ji rêxistineke navdewletî ve, rapora Rêxistina "Hiyûmen Rayts Wotş" rastiya komkujiya Cindirêsê anî zimên, lê tiştê ciyê mixabiniyê ku dezgehên Neteweyên Yekgirtî yên girêdayî

bûyerên weha û hemî hikometên herêm û cîhanê li beramberî vê tewana qirêj (a ku di dermafê giropeke sivîl û cejna miletekî dora /50/milyon nişte hatiye kirin de) hîna bêdeng in.

26.03.2023 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Herçar pakrewan, qurbaniyên komkujiya Bajarê Cindirêsê, /20/ê Avdara 2023an. Z.
- Xwepêşandana oxorkirina termên herçar şehîdan li B. Cindirêsê, /21/ê Avdara 2023an. Z.
- Işkencekirina "Fereh El'dîn Osman" li destpêka dagîrkeriyê sala 2018an. Z.
- Herdu pakrewan "Hisên Ebid El'rehman Hisên/24/sal, Welîd Soranî kurê Cemîl/18/sal" ji xelkê G. "Çeqelê Cûmê" - N. Cindirêsê.
- Kujerên ku komkujiya Cindirêsê cîbicî kirine, /20/î Avdara 2023an. Z.
- "Hisên Hemadê" serkêşê "Tevgera El'tehrîr we El'bîna'i/Rizgarkirin û avahiyê" û "Hatêm ebû Şeqra" serkêşê "Ehrar El'şerqiyê".
- Qutkirina darên zeytûnê li G. "Tilifê" - B.Efrînê , ji aliyê Milîseyên"Firqit El'hemze" ve.
- Qutkirina darên zeytûnê li G. "Feqîra" - N. Cindirêsê, ji aliyê Milîseyên "Firqit El'hemze" ve.
- Qutkirina dareke sindiyanê ye temenmezin li Bajaroka "Şera".